

radio û televîzyonê guhdarî bike, ka Kurdên beşên din kîjan peyvê ji bo filan tişt bi kar tînin. Ne hewce ye, ku ez bê agah bimînim.

Standardkirina zimanê kurdî karê zimannasên kurd e, an yê siyasatmedaran e, an jî yên mirovên 'normal'e, an karê hemî Kurdan e? Ji bo vê yekê çi divê pêk were?

Ez bi xwe gotina 'siyasetvan' bi kar tînim; ji bo min 'siyasetmedar' farisî ye. Gelek Kurd wiha difikirin, ku taqeta wan ji bo guhertina rewşê tune. Lê ez dibêjim na, wisa nîne. Her bavê kurd dikare li mala xwe biryarê bide, ku 'ji îro û pê ve, em ê tenê bi zimanê kurdî bipeyivin û vî zimanî biparêzin. Li derve di nav kuçê de, ew tiştêkî din e, lê di nav malê de emê hewl bidin vî zimanî biparêzin'. Her bav dikare biryareke wisa bide, çi li Kurdistanê û çi li Ewropayê.

Derbarî vê yekê, tu xebata hêzên siyasî yên kurd erênî an neyênî dibînî?

Eger ew bi xwe hînî rêzimana zimanê kurdî û peyvên nû bikin, dê gelekî başbe. Lê ta niha, gelek siyasatvanên kurd an bi tirkî, yan bi erebî, yan bi farisî dipeyivîn. Wan xwe bi van tiştan ve mijûl nedikir. Lê bi rastî ez nizanim ka rewş îro çawa bûye.

Gelek Kurd bi zimanê dagîrkeran difikirin û bi zimanê kurdî dipeyivin.

Tu li ser vê yekê çi dibêjî?

Ji bo min giring e, ku gava ku mirov peyvên standard ji bo radyo û televîzyonê biafrîne, gerek mirov wisa bifikire, ne 'di gundê min de çawa dipeyivin'. Daxwaza min ew e, ku ta li dûrtirîn gundê Kurdan her kes bi hesanî fêhm bike ez çi dibêjim. Li gor vê yekê, divê ez gotinên xwe bibêjim. Bo mînak, li Kurdistana Tirkîyê gelek kes bo 'telefonkirin' 'lêgeran' bi kar tînin, ji ber ku bi tirkî dibêjin 'aramak' (bi kurdî: ezê li te bigerim, yanî ezê telefonî te bikim). Lê eger tu ji Kurdekî Sûrî, an Iraqê an Îranê bipirsî 'ez ê li te bigerim, yanî çi?', ewê tiştêkî din fêhm bikin. Ew fêhm nakin, ku mebesta te telefonkirin e.

Ewê wisa fêhm bikin, ku tu yê derkevî û li bin keviran lê bigerî.. (dikene) Ji ber vê yekê, ez dibêjim, ku bila gava pêşîn ev be, ku em xelkê agahdar bikin, ku gava ew peyvên wisa bi kar bînin, ev dibe astengek li ber yekgirtina zimên jî û xelkê jî. Di nav Kurdên Sûriyê û Iraqê de jî gelek peyvên di bin tesîra zimanê erebî de hene, û li Îranê jî peyv hene, ku di bin tesîra zimanê farisî de ne. Ev gava pêşîn e. Haya kêma kesan ji vê meseleyê heye. Piştî ku me ev kes agahdar kirin, ku pirsgerêkeke wisa heye, wê demê em dikarin li hev rûnên û bifikirin, ka em çi ji bo yekgirtina zimanê kurdî bikin. Eger her kes di vê proseyê de beşdar be, hewasa wan jî dê bilindtir be. Ew dê bêje: 'weleh tiliya min jî di vî karî de heye, û ji bo min jî giring e, ku bi ser keve.'

Gelek rewşenbîr û zimannasên kurd tim dibêjin, ku ger welatekî meKurdan çêbibe, hemî pirsgerêkên ziman çareser dibin. Tu çi dibêjî?

Belkî tu Kurdistan çênebe jî..

Bi dîtina min, gotineke wiha tê wateya, ku 'êdî em naxwazin û em zimanzan nînin, bo me siyasat giring e. Em ji zimanan û ji zimanzanîyê fêhm nakin. Em ê bihêlin ta dewlet çêbibe.'

Bi rastî ihtîmaleke mezin heye, ku tucar tiştêkî wisa (Kurdistan/SHB) çênebe. Bo min, eger em weke mînak li vejandina zimanê ibrî binerin, Isarîl di sala 1948an de hate damezîrandin. Lê vejandina zimanê ibrî hinekî zûtir dest pê kiribû, di destpêka sedsala 20an de. Gelek Cihû bi vejandina zimanê ibrî ve mijûl bûn. Ez dibêjim, ev mînaekeke başe bo Kurdan. Ne hewce ye, ku em li hêviya damezîrandina dewleteke kurdî bimînin, ku em zimanê kurdî bi pêşxînin.

Em çi bikin?

Bi rastî, em dikarin di rêya televîzyon û internête gelek tiştan bikin. Fekirîna Kurdan ew e, ku her kes di gelîyê xwe de dijî, bêyî ku lêbikole, ka ta îro çi ji bo standardkirina zimanê kurdî hatiye →